

## Tenê rêya aramiyê pêkvejiyan e

Gelên Kurd û Azerî li Urmiyê û deverên din ên Kurdistanê divê bînin bîra xwe ku tenê bi yekîtiyê dikarin rê li ber wan xeteriyan bigirin ku rejîm û hêzên tundrew ji bo wan çêkirine. Ji bo gihiştina bi pêşerojeke ronî û domdar, pêwîstî bi piştrastbûn bi nirxên mirovî, çandî û civakî heye.

Dom»R:6




*Bidesîveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (493)05-05-2025Buha (1000) Tûmen*



## Qeyrana “nasnameya niştimanî” li qonaxa nûgihanî û ciwaniyê de li nav gelên dagîrbûyî de

Qeyrana “nasnameya niştimanî” yek ji pirsên kûr û aloz ên civaka dagîrbûyî wek civaka Rojhilatê Kurdistanê, bi taybet li nav ciwanan de ku mijûlê avakirina kesayetiya xwe ya kesîn û civakiya xwe ne. Koloniyalîzm wek peydabûyek çendîn alî, ne tenê her bandor bi ser pêkhateyên aborî û siyasiyên civaka dagîrbûyî de heye, belku bûye sedema qutbûna kûr a kultûrî û hundiriya wan jî.

Dom» R:7




## Konferansê Qamişlo û giringiya parastina yekrêziya kurdî

Piştî helweşandina rejîma Be’is ya Sûriyê di 8ê Kanûna Pêşiyê 2024an de, û hatina Bereya Elnusra ya bi nav (HTŞ) ya di nav lîsteya rêxistinên terorîst de li ser desthilata Sûriyê û heta niha ku hîç guhertinek erênî ber bi mafên mirov û ber bi çareserkirina pirsgirêkên Sûriyê nehatine pêkanîn, û her wisa ku asoyek zelal bo çareserkirinê yan bo başkirina rewşa siyasî û aborî nehatine dîtin......

Dom» R:10

# Hizba Dêmokrat: Siyasetên şaş û bikêrnahtiya komara îslamî, canê xelkê û mafê jiyana wan kiriye armanc



Hizba Dêmokrat: Siyasetên şaş û bikêrnahtiya komara îslamî, canê xelkê û mafê jiyana wan kiriye armanc.

Bi sedema teqîna li wêzgeha quraxaviya Recayî ya bajarê Bender Ebasê li roja Şemî 6ê banemera 1404 a Rojî, heta niha zêdetir ji dehan kes ji xelkê medenî û zêdetir ji hezar kes sedeme dîtine an birîndar bûne.

Agirpêketina li encama vê teqînê û egera zêdebûna qurbanî û kuştiyan li vê bûyerê de her berdewam e.

Ew teqîn û bûyerên hevşêwe, encama siyasetên şaş û bikêrnehatiya komara îslamiya Îranê ye ku ti nirx û girîngiyekê nade canê xelkê wî welatî.

Bilî gotinên cuda yên berpirsên rêjîmê li derheq sedem û çawatiya qewimîna vê bûyerê, derb û xisarên canî, cihê lêhûrbûn û bi janê ye.

Bêguman, rêjîma zordar a komara îslamî li hember canê xelkê û mafê jiyanê bo wan, xwe bi berpirsyar nezane mixabin rewşeke wiha bi ser xelkê wî welatî de sepandiye.

Tevî hevxemî digel malbatên qurbaniyan, em hêviya çêbûna bo birîndarên vê bûyera tal dixwazin.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**Desteya Kargêrî**
**1404-02-08**



## Bikaranîna blagêran ji aliyê rêjîmê bo asayîkirina rewşa dagîrkarî li Kurdistanê

Dom » R:5



## Qurbanîkirinan welatiyên medenî bo peçavtina şikestên Spaha Pasdaran

Dom » R:9

# Rêzdar Mistefa Hicrî peyameke hevxemiyê bi hilêkefta koça dawî ya Papayê Vatîkanê, belav kir

**Rêzdar Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta koça dawî ya Pap Firansîs, peyameke hevxemiyê belav kir.**

Deqa peyamê wiha ye:
Koça dawî ya Pap Firansîs, Papayê Vatîkanê, em xembar kirin.


Pap Firansîs di heyama tekoşîna xwe ya olî de, sîmbola aşitî û tebayî û dadperweriyê bû û hemû cehda wî bi armanca dabînbûna nirxên bilinde mirovê bû.
Bi vê hilkeftê, ez ji aliyê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê ve, sersaxî û hevxemiya xwe pêşkêşî hemû kirîstiyanên cîhanê û bi taybet kirîstianên Kurdistana Îranê dikim û hevxemiya xwe radigehînim.

Hevdem hivîdarim ku bîr û hizra mirovhezane a Pap, bibe hêvînê aşitî, azadî û dabînbûna mafê vekhev bo hemû mirov û neteweyekî niştimanpewer û azadîxwaz.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**Sekreterê Giştî**
**Mistefa Hicrî**
**21ê Nîsana 2025 a Zayînî**



# Peyama Desteya Kargêrî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta 12ê Banemer, roja Xwendekarê Kurd




**Xwendekarên azadîxwazên Kurd!**

**Xwendevan, mamosta û xwendevanên dilsoz ên Kurdistanê**

Roja 12ê banemerê, bi bîranîna xebat û canfîdayiya xortên netirs û bivêrên netewa kurd e ku li çepera nasnamexwazî û mafxwaziya wan ji zanîngehê ve bo çiya, hat veguhastine.

57 salan berî niha li rojek wiha de ku li rojjimêra tevgera rizgarîxwaziya netewa me de bi roja "Xwendekarê Kurd" hatiye navdêkirin, Simayîl Şerîfzade yek ji emegnastirîn xortên Kurd û refek ji hevalên wî li pêxema azadî û dadperwerî û mafên netewî de canê xwe fîda kirin.

Tevî ku dîroka vê xebata tejî ewraz û nişîv, tejî qehremantî û cangorîkirinê ye, lê eva ku vê qonaxa dîrokî ji qonaxên din heta astekê cuda dide xuya, bo vê yekê vedigere ku yêk ji pêşengên vê tevgerê, ciwanekî xwendekar bû ku bi gernasî li nav metirsiyan û gefên dujmin ve meşxela xebata nasnamexwaziya Kurd girte destê xwe û bi cangorîkirina xwe û hevalên xwe, girava aram a sîstema paşatiyê hejand ku îdia dikir ku jandarmê deverê ye û ti dengeke nerizayetiyê li jêr sîbera desthilat û hikumdariya wê de nayê bilindkirin.

**Rweşenbîr û evîndarên pênû û zanistê!**

Her wek hûn jî dizanin, xebata çendalî ku li ser rastiyek ku nayê înkarkirinê, hatiye avakirin, ku ew rastiya ji aliyê dujminên Kurdan ve bi berdewamî tê înkarkirin û bi nav û navdêrkirinên curbicur ve hewla şermezarkirina vê tê dan. navendgirayên dujminê Kurd li propagandayên xwe de vê xebata rewa, dûr ji şaristanit û eqlaniyetê pênase kirine ku bi hizra wan, xebata Kurd bi tenê aliyê çekdarî heye û ew aliya jî çi şiroveyeke serdemiyane û lojîkek li pişt nebûye û nîne.

Lê hebûna qata xwendekar û pênûsbidestên li refên xebatê bi taybet li refên Hizba Dêmokrat de selimînerê vê ye ku xebata Kurd, hilgirê nav û nîşaneke mirovperwerane ye û bilî binyata vê ya bi hêz û qahîma vê, şirovekirinek akademîk û zanistî jî li pişt de ye û xûyakirina navê kesayetiyên akadmîk ên wek şehîdan Dr. Qasimlo, Dr. Şerefkendî û Simayîl Şerîfxade, li asta şehîdên rêber û dehan û sedan şehîdên xwendekar ên din, bersiva vê şaşiya dujmin didin û diselmînin ku xebata Kurd li pêgeh û cihê rast a xwe de ye û heta bidestveanîna armanac û xwestên rewayên Kurd, berdewam e.

Beşdariya berdewam a xwendekarên Kurd li xebata netewî-dêmokratîka Kurd, bo hêmaya zanistîbûn û resenbûna vê xebatê bûye fakterek bihêz û vê yekê wiha kiriye ku niha û bi taybet li dema tevgera Jînayê de çepera zanîngeh û zanistgehên Kurdistanê, ji berê avedantir û xwedîsehtir, li hember dujmin û siyaseta helandin û asimîlasiyon û qirkirina Kurd de bisekinin û wek hertim, li refên pêşve, vê rastiyê li guhê dujmin de bikin hawar ku Kurd zindî ye û namire.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, tevî bi bilindragirtina vê rojê û şandina silavan bi yad û rihê şehîdên doza rizgariya Kurdistanê, li serweyî hemûyan, Şehîd Simayîl Şerîfzade û hevalên wî, daxwazê ji hemû xwendekarên Kurd dike ku wek hertim li dijî hizra navengira a dujminên Kurd li Îranê bisekinin û bi hişariya xwe, rêgirî ji cîbicîkirina pilanên vê raya paremayî bikin.Herwisa bi yekîtî û karê hevpar digel xwendekarên netewên sitemdîtiyên Îranê, heta gihîştin bi azadî û demokrasiyê, xebat û tekoşîna xwe berdewam bikin.
Serbikeve xebata netewî-dêmokratîk a Kurd!
Biherîfe rêjîma sitem û bêdadî û navendgirayî!

**Desteya Kargêriya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**12 ê Banemera 1404 a Rojî**

# Aliyên dîrokî, exlaqî û felsefî di serhildana şoreşgerî ya 1346 û 47'an li Rojhilatê Kurdistanê de



N. Serbest Urmiye

**Destpêk**

Serhildana şoreşgerî ya salên 1346 û 47'an li Rojhilatê Kurdistanê, bilindtir ji serhildaneke siyasî û çekdarî, qonaxeke bingehîn di guhertinên rewşenbîrî, exlaqî û felsefî di têkoşîna rizgarîxwaziya gelê Kurd de tê dîtin. Serhildana han ku di bin rêberiya kesayetiyên wekî Şehîd Silêman Muînî, Şehîd Îsmaîl Şerîfzade, Şehîd Niho Paşayî (Bapîr Şakak), Şehîd Mela Aware û ..., de destpêkir, di ji nû ne darêtina gotara berxwedanê û vejandina nasnameya neteweyî û exlaq di têkoşînê de, weke destpekek din ya dîroka xebata rizgarîxwaziya gelê Kurd de tê hijmartin. Di vê gotarê de, hewl tê dayîn ku bi kurtî aliyên dîrokî, exlaqî û felsefî yên vê serhildanê werin şirovekirin.

**Serhildana 1346 û 1347an**

Serhildana şoreşgerî ya han ku bi serhildana çekdarî ya 1346 û 1347an tê naskirin, bi felsefe û ramana parastina nasnameya neteweyî û dadperwerî ji bo civakê, bizav û biriyareke şoreşgêrane bû li hember hikûmeta Pehlewî. Her çend ku bi terzeke tund û hovane ji aliyê rejîma dagîrker ve hate serkutkirin, lê bandoreke giran danî ser tevgera rizgarîxwaziya Kurdistanê û rêber û tekoşerên serhildanê bûne hêmaya berxwedana neteweyî di dîroka gelê Kurd de.

**Hegerên dîrokî yên serhildanê**

**- Zordarî û serkuk**

Piştî hilweşandina Komara Kurdistanê di sala 1325an a Rojî de û ji aliyê rejîma dagîrker a Pehlewî ve, siyasetên serkut û bişavtinê yên hikûmetê bi taybetî li Rojhilatê Kurdistanê pê havêtin qunaxeke nû û di rengekî herî tund de dimeşiyan. Sîstema dagîrker vê care tenê li hêza leşkirî bo dagîrkirina Kurdistanê mifah wernedigirt, belku di sîstema xwe ya nû de rejîma Pehlewî hewil dida di rêya tevlîhevkirina nasnameya neteweyî, çandî, civakî û.. ya neteweyên din û bi xasmanî gelê Kurd, bi girîngîdan bi zimanê Farsî, nasname û dewlet neteweyeke sextet bi nave Îranê ji bo cihgîrkirina hikûmeta xwe damezirîne. Lewma dezgehên leşkirî û ewlekarî yên rejîmê bi tundî berhingarî her bizaveke nerazî di aliyên siyasî, civakî, neteweyî û çandi de dibîn û tepeser dikirin. Rewşa han jî bû sedem ku hêz û aliyên siyasî yên Kurd biriyara berxwedaneke tevalî li dijî sîstemê bidin.

**- Bandora guhertinên cîhanî yên hevdem**

Deh sala 1340'ana Rojî, di Iran û Kurdistanê de hevdem bû tevî guhertinên mezin yên cîhanî ku ji hemiyan xuyatir serhildanên li dijî dagîrkariyê di piraniya welatên naskirî bi cîhana sêyemîn û serkewtina şoreşê Kubayê bûn. Hevdemî xwendekar û rewşenbîrên herêmên din yên Îranê, xwendekar, çalakvan û rewşenbîrên Kurd jî di bin bandora wan guhertinên cîhanî de û di pêxema azadiyê û parastin û xurtkirina nasnameya xwe ya neteweyî de xwe rêkxistin û bizavek li dijî sîstema dagîrker destpê bû.


**Şiroveya exlaqî ya serhildanê**

Bi giştî, şoreş derfetek e ji bo perwerdekirina têgeha exlaq di civakê de. Dema ku gel li dijî neheqî û tundûtûjiya neteweyî, siyasî, civakî û ..., serhildide, di rastî de amade ye ku ji bo bi destxistina azadî û wekheviyê bimire. lewma, mirovên şoreşger bi berxwedana xwe li hember zordaran û fedakirina xwe ji bo azadiya neteweyî, siyasî û civakî, dibin çavkanî ji exlaq di dîrok û jiyanê de .

**- Exlaq di xwe gorîkirin û têkoşînê de**

Serhildana şoreşgerî ya salên 1346 û 47an li Rojhilatê Kurdistanê ji weke piraniya serhildanê hevdem, di rewşeke dijwar a aborî, civakî û siyasî de destpêkir. Şervanên Kurd dema ku biriyara serhildanê dan, Ji bilî serkuta rejîma Pehlewî, ji piştevaniya dereve û alavên pêşkewtî yên şerê çekdariyê jî bê par bûn. Di rewşeke wiha de ye ku têkoşîn û qurbanîdana ji bo azadiyê bi stûna exlaqî ya şoreşê tê hesibandin.

Armanca serhildanê ne tenê serkewtina leşkerî bû, belkû ji bo parastina kerameta mirov û dadperweirî di civakê bû. Serhildan li dijî newekhevî û zordariyê hewcedarê xwe gorîkirina takekesî û giştî ye ku ev yek di raman û kiryarên şoreşgerên vê serhildana 1346 û 47an de tê dîtin. Têkoşerên vî heyamî, ji bilî prensîbeke exlaqî, xwe gorîkirin weke pêvajoyekê di sitratejiya şoreşgerî de pênase kirin.



**Şiroveya felsefî ya serhildanê**

- Azadî wekî pêdiviyeke giştî

Di serhildana şoreşgerî ya 1346 û 1347an de, azadî ne weke têgeheke takekesî, belku azadî weke armanceke felsefî û piraktîkî bi xasmanî di meydana xebata şûnasxwaziya neteweyî , civakî û dîrokî de di pêxema wergirtina mafên gel de hatiye pênase û şirove kirin. Rêber û şoreşgerên Kurd yên vî heyamî azadî bi kerameta mirovan, wekheviya civakî û serxwebûna neteweyî ve girêdan.

**- Şehîdbûn wekî kiryareke diyalektîkî**

Mijarên dîrokî di nêrîna felsefeya dîrokî ya Hegel de, ew kes in ku bi beşdariya zanistî û têghîştinê hewil didin ku rastiyên siyasî û civakî û .. biguherin. Li gor vê ramanê dibe ku şehîdbûn weke hilbijartineke zanistî û diyalektîkî were bas kirin ku rêyê ne tenê li ber guhertinên takekesî, belku li ber guhertinên dîrokî, siyasî û civakî jî vedike. Rêber û şoreşgerên Kurd jî, bi tevahî haydarî rewşa siyasî û civakî ya Kurdistanê bûn, lewma mirina zanistî hilbijartin, di çarçoveya vê ramana felsefî de, Şehîdbûna wan bilindtir ji guhertina takekesî, destpêkek e di guhertina dîroka berxwednana gelê Kurd de, bo selimandina nasnameya neteweyî.

**Hêz û berxwedan**


Şehîdbûna şoreşgerên Kurd di salên 1346 û 47an de li Rojhilattê Kurdistanê, mînakeke zindî ji diyalektika hêz û berxwedanê bû. Wan bi şehîdbûna xwe di heman demê de ku penaseyeke nû ji berxwedanê pêşkeş kirin, zordarên wê demê jî kişandin meydana şer û ber bi rûyê astengên nû kirin. Di ramana "Michel Foucault"(Mîşêl Foko) de, hêz her tim girêdayî berxwedanê ye. Berxwedan û şehîdbûna van şoreşgeran mînakek e ji vê ramanê, ji ber ku ji bo herman û xurtkirina nasnameya gelê Kurd hewce bû.

**xebata siyasî, herman û ji nû ve tomarkirina dîrokê**

Her wekî ku "Hannah Arendt"(Hana Arênt) tekezê li ser xebata siyasî di afirandia dîrokê de dike, şehîdbûna têkoşerên vê demê, dibe ku weke kiriyareke siyasî were şirove kirin ku bertekek bû li dijî bizava bişavtin û çinekirina nasnameya neteweyî ya gelê Kurd.

"Jacques Derrida"(Jak Dirîda) di teoriya xwe ya li dor têgeha hermana giştî de, dibêje ku dîrok ji bo ku hertim bimîne, pêdiviyê ji nû ve tomar û şîrovekirinê ye. Di hevrikiya di navbera her du gotarên tepeserkirin û berxwedanê de, şehîdbûna van şoreşgeran weke bingehek din di pêvajoya ji nû ve tomarkirina dîrok û selimandina nasnameya neteweyî de tê hesibandin. Şehîdbûn bi vî terzî, ne bi wateya bi dawîhatina jiyanê ye, belku ji nû ve destpêkirineke di tevgera nasnameparêzî û rizgarîxwaziya gel de.

# Desthilat û îdeolojiya zimanî li daxuyaniya bi gef a 800 êlîtên Îranî de



N. Dr. Rehîm Surxî

**Beşa 2**

**Desthilata welatê "çendîn netewî" an welatê "çendîn etnîkî"**

Neku her li Îranê, belku li hemû parçeyên dagîrkirî yên Kurdistanê, Kurd û zimanê vê, nabin pêkhateyeke"etnîkîçandî", ku li cura "civaka kêmîne li şêwza jîngehparêzan an regezxwaziyan" de bê polênkirin. Nabe ku li şêweya komên zimanî yên kêmîne Koçber û belavbûyî li welatek wek Amedrîka an Ewropayê bêne dîtin ku bi daxwazî an bi sedema neçarî, penah bo wan welatan birîne û naçar in digel ziman û çanda wan welatan bisazin û dewletê jî ti pêbendiyek bi dabînkirina mafên kultûriyên giştî û takekesan nebe.

Ewên ku Kurd bi vê şêwazê pêlên dikin û li jêr navê "metod a nû" de banghêjiyê bo vê dikin, li rastiyê de mijûlê revîn bi pêşve ne, ber bi heliyan û asimîlebûnê ve diçin. Ew pêkhateya ev e ku wek "Kîmlîka"(1995)ê de dibêje, bizanin çawa pênaseya "welatekî çendîn zimanî" dikin.

Hewce ye bizanin ku çendîn zimanî ku li nav welatekî çendîn netewî de ye an li welatekî çendîn etnîkî de ye. Banghêjiya Kîmlîka bo reftarkirine vekhev digel zimanan, li ser vê binyatê hatiye avakirin ku guherîne her nevekheviyek bo derfetek "baş û vekhev" nabe bi hilbijartiyên take kesên berketiyê vê nevekheviyê ve bê girêdan.

Wek mînak, li derheq gelê Kurd de em li rewşeke nexwestî de ne û bi neçarî kevtine nav vê rewşê ku nevekiheviya derfetên hilbijartinê û destpêregihîştin vê çê kiriye.

Bi vê sedemê, dema hilbijarti9nekê dikin, dibe berpirsayetiya encamên wan hilbijartinan li stu bigrin. Lewma ev nikare bo kesekî Kurd rewa be, çimkî mafê xwedîderketina ji ax, ziman û destrhilatarî bi ser civakê de bi rêya dagîrkariyêî ve ji wan hatiye standin; Lewma, teoriya "civaka demokratîk" an eva ku li daxiyaniya binav êlîtên îranî de jî bi navê "mafê sirûştî" an "mafê bajarwendiya Îranî" hatiye, li wî warî de dişile ku li pêgeha tak û nûneratiya "civaka serdest" ve " civaka dûrxistî" bo vê radikêşe ku dest ji avakirina desthilatê berdin ku nekare li hember desthilata wan de bisekine. Bi awayek giştî û bi taybet li asimîlasiyonên li Tirkiye û Îranê, wa hizir dikin ku tişteke dadperwerane ye ku wek axîwera civaka zimanê Kurdî li Kurdistanê ye jî, bi vê pêkê, koçberên Kurd û nerewên din li welatên derve ku bi azadî ew welat(welatê Ewropî) hilbijartiye, pêbend bi zimanê wan jî ne, ewan jî biryara "tekekesbûn"a azad hebûne û hene û erkê welatê wan nîne ku piştevanî li çalakiyên vekhev li zimanê axêwera Kurd an netewa din jî bike.

Lewma, hewceye ku li navbera welatên "çendîn netewî" û "çendîn etnîkêî de cudatê bê danîn, welatên wek Îran, Îraq, Tirkiye û Sûriyê, welatên çendîn netewî anku "Multi National" in ne çendîn etnîkî anku "Multi Ethnic", çimkî bi rêya telihevbûna du an zêdetir a netewên ku pêştir hebûne (bi rêya dagîrkirin û tevlêkirin a yekgirtina xwexazane" we hatine komkirin(Kimlîka1995) ku dewlet dibe pêbendê parastin a mafên wan, çi bi şêwayeya bi kom an bi şêwaya tak bin û cuda bin li welatên çendîn etnîkî, ku li ser binyata hilbijartin a teke kesan li encama koçberiyên biçûktir de hatine avakirin.

Lewma ew banghêjî ya pêkhateyeke netewî wek Kurd, wek derketiyeke civakî dinirxîne û kêlera bi desthilata dagîrker dide nîşandan bo vê ku li ser binyata pêşegerên rewadîtin a nasyolaîzma neteewa serdest li çarçoveya dewleta demokratîkn de ku civaka serdest ava kriye, ji revîn bo pêşve de Kurd bi têdeçoneke xwexwezane ve dibe. Çimkî pêşwext de pêgeh, hêz û derfet û desthilata aborî û teknilojiyia Tirk-Fars, erê kriye û w3a hizir dike li ber pevrejiyana dîrokî ya gelê Kurd digel wan de hewcehî bi heta rêçareyeke çandî jî nake, çimkî ew ji nasyonalî,zma tundajo li ser hatiye avakirin.

Ev yek li halekê de ye ku her ew cure mêzekirin, encama tirs li siyasîbûna




ziman ve hatiye, pirsa çand û ziman dike pirsgîrêkek siyasî-civakî û tepeserkirin û lempoerdanîn dibe hêcet, her wek li deqa daxuyaniyê de hatiye, lewma wek rêçare û derhavêtina desthilat û îdeolojiyê li hilkeftên civakî de ku pêşwext hene, bi desthilata netewa fars pêşniyar dike, bi lezgînî her bi xwe nîmçe azadiyekê bi Kurd bide û jê netirse, çimkî hewcehiyên jiyanê, zimanê xwe çê dike û ti tîşkek bi navê pirsgirêka zimanî û nasyonalîzma tundajo û civaka dûrxistî, namîne. Ecêb e ku ew dîtingeha her bi vê lojîka nasyonalîzm a netewa serdest bi rewa dibîne û ji peyva cirîsoka " dewleta demêîkratîk" de reng dide, her bi vê lojîkê jî, nasyonalîzma netewa bindestkirî bi rewa nizane û bi pareman, dije jin, mêrsalar û gelek navên xirabtir, tometbar dike.

**Encam**

Li dawiya vê daxuyaniyê de, êlît ji hikûmeta xwe wek dezgeha birêvebirênê razî nînin û bi nepirsporiyê tometbar dikinî ku li rewşa perîşan a welatê wan de li tepesderkirina kurdistanê de xemsar bûne. Herwisa gazinde dikin ku bo berpirsên îdarî yên parêzgehên Îranê, li Xûzistan, Kurdistan û Azerbaycanê bi zimanê fermî naaxivin. Ev bi xwe nîşanderê vê rasiyê ye ku bi tenê dewlet û dezgehên dewletî nînin ku dikarîn tepeserker bin, belkû êlît jî ku perwerdeyê çarçoveya çandî, zimanî û civakiya civaka serdest in, dikarin bi sedema alavên serkta dewletî bibin bi destpêkerê tundûtîjiya meirîfî an handerê serkutkirina tundîtîj a netewên bindestkirî bin. Ew yeka li halekê de ye ku pirsa ziman û çandê jî li welatên çendîn zimanî û çendîn netewî wek Îranê de bi hêza naskirina siyasî û civakî û axêwerên vê ve girêdayî ye. Lpê êrîşkirina zimanî û gotarî ya êlîtên netewa desthilatdar, hêcethêner û rêxweşkerê her cure êrîşkirinek û tepeseriyeke bi kiryar û fizîkî bo ser netwa Kurd e û bervajiyê reftara nerima aşîtîxwazane, şad bû bi germ û dijî tundîtêîkiya li Rojhilatê Kurdistanê û mafên vê yên mirovî ye.

Û hewldanek bo bo çavtirsandin û serkutkirina netewa me ye ku li rû de bi reftareke tundîtîjane ya "darbidestên rêjîmê" li bajarê Urmiyê de xwe da xuya. Lê rastî ev e ku ew şêwaza gotarî, nîşanderê tirs û revîn li derza netewan e ku ji rastiyeke dîrokî, çandî, siyasî û civakiyê ve tê û lawazî û binyata çawatiya çeqa desthilata tak a netevî ya dewletên dagîkerên Kurdistanê, ew tirsandine û "tirs ji Kurd" çavê rastîdîtin a hindek êlît û akadêsiyanan jî girêdaye.

Netewa me hewcehî bi serketin bi ser cudatiyên îdelojîkî û berjewendî yên hizbîyên berçavteng de heye, herwk çawa mijîlê xwerêkxistinkirinê ye û bi şêwazeke giştî ya serdemiyane xwe dide nîşandan, ew cudatiya idelojîkî nya berjewendîxwazaneyên hizbî û taqimane bi mentiqek zîreka giştî û bi kom a xwe de bihelîne û hemûyan bike bi hêza bizvêpner a tevgera aşîtîxwazaneya xwe.

# Bikaranîna blagêran ji aliyê rêjîmê bo asayîkirina rewşa dagîrkarî li Kurdistanê



N. Bêhzad Qadirî
W. Bêhzad Simko

Rêjîma dagîrker a Îranê li Rojhilatê Kurdistanê û (herwisa li herêmên dinê ên wek Belûçistanê), bo asayîkirina rewşa dagîrkarî(Koloniyalîzm)ê, çendîn şêwazên curbicur bi kar tînin. Yek ji alavên karlêker ku li wan salên dawiyê de bi kar aniye, Blagêrên bi rûkê serbixwe ne. Blagêr anku kesên ku bi giştî vîdyoyan çê dikin û li torên cîvakî de belav dikin(Pêştir Blager bi wan kesan dihate gotin ku malper an wêblag hebûn û babet dinivîsandin).

Li vê goratê de ezê dê îşare bi şêwaza karê wan Blagêran, mînakên rast û modelên diyarîkirî yên asayîkirina dagîrkarî bi rêya Blagêran li Kurdistanê û herwisa torên destçêkiriyên Blagêrên hikûmî li Kurdistanê de bikim.

**Şêwaza karê Blogerên pêspartî li Rojhilatê Kurdistanê**

Komek ji wan Blagêrên li rûde bala wan bi ser mijarên wek "xwarin, geştiyarî, Kultûr an dîrok" ye, lê li kiryar de dana xûyaye fermî ya desthilatê ye ku bê rexnekirin, têne berhemanîn. Wek mînak, dîmena Kurdistanê bi şêwazekê didin ber çavan ku ti nîşaneyek ji tepeserî û hejariya pêkhateyî an cudatîdanînê pêve xuya nake, Belku jiyaneke asayî û rengfrengî û bê aloziyê didin ber çavan.

Beşek ji wan Blagêran ji aliyê navendên îtilaatî û çandiyê ve ên wek spaha pasdaran, Îrşada Îslamî an wezareta îtilaatê, rênimênî an piştevaniya malî li wan tê kirin, ew jî bi armanca darêştina naverokê ye ku pêgirtiya dagîrkeriyê perdepoş bike. Renge ev hevkariya eşkere û xuya nebe, dibe ku bi şêwaza dana heqdest, alîkarîdan bo çon bo seferan, derfetnameya taybet an heta "parastibûn ji jêpirsînan" be.

Her ew Blogerane ne ku di cihê rohnkirina "serkuta siyasî, cudatiya zimanî, hejariya aborî an milîtareîzekirina berfireh li Kurdistanê", bala xelkê bo aliyê tiştê bêçine û negirîng radikêşin, wek nasandina xwaringehek nû an festîvaleke xwemalî, bo vê ku bidin xuya Kurdistan li rewşeke tevav a xweşderbaskirinê de be.


Hinek din ji Blogeran, bi piştguhavêtin an biçûknîşandana xebata gelê Kurd bo mafên mirovî û netewî, wa bi temaşevanên navxweyî û heta biyanî didin nîşandan ku seh bikin Kurdistanê de ti pirsgirêkek taybet nîne û pirsgirêkên vê, "xwecihî" û "biçûk" in. li rasiyê de ew wek delalê rewatîdanê kar dikin. Bi sedema vê ku Kurdî diaxivin û kincên Kurdî li xwe dikin û xwe wa didin xuya ku nûnerên civakê ne, temaşewan wa dihesîbîne ku ev pêgirtiyane, xwerêkxer û giştî bin nek destçêkirî.

**Mînaka rast û modelên diyarîkirina asayêîkirina dagîrkariyê bi rêya Blogerên pêspartî li Kurdistanê**

Piştî şoreşa Jînayê û tundbûna tepeseriyan, rêjîmê projeyek a bi navê "geşedan bi geştiyarî li Kurdistanê" dest pêkir. Wan blogerane pêştir bi tenê wêneyên xweza an xwarinan belav dikirin, li jêr navê "asayîşa tevav li Kurdistanê" mêwandariyên bê mînak û xelkê mêhribanê Kurd" dest bi propagandayên geşekirina navxwyê Kurdistanê kirin. Armac ji vê yekê ew bû ku dîmena tundûtîjane û rast a tepeseriyan, hejarî hebûna hêza giran a serbazî, kêmreng bibe an nemîne. Wek mînak sefera Blogerên binavbang ên Tehranê bo Kurdistanê dest pêkirin û li girtevîdyoyan de bi berdewamî bas ji vê yekê dihate kirin ku ti xalên vekolînan ên hêzên hikûmî li rêyan de nînin û ti bas an nûçeyek ji hejariya berfireh nîne.

Ji aliyê din ve, hinek ji Blogerên Kurd-Hinek ji wan ên ku li ser pirsên çandî dixebitin- dest bi sansorkirina qeyran û cudatîdanînan kirin û bi eşkere, xwe ji îşarekirin bi qedexekirina wanegotin bi zimanê Kurd li xwendingehan, jikarderxistina mamostayên Kurd an tepeserkirin hilkeftên Newrozê, xwe parastin. Wek mînak li derheq Newrozê de postên xwe belav dikirin, lê ti îşareyek bi girtina bi kom a beşdarbûyên rêûresma Newrozê nedikirin.

Ji aliyê din ve rêjîm bi piştevanîkirin li hinek kesan, hewlê dide ku rewaletekî çê bikin ku bibêjin: "mêze kin! Kurdek jî dikare li Îranê de serkevtî be", ev rûkane bi kiryar cudatîdanîna pêkhateyî, înkar dikin. Wek mînak: "wan Blogerane ku çêroka bazirganekî serkevtî yê bajarê Banê an xwediyê xwearingehekê li Sinê, mezin dikin û wan serkevtinên kesîn dêxin cihê daxaziyên bi kom ên wek "dadperweiya aborî".



Hewleke din a Blogerên pêspartî, birandkirina etnîkî ya dûr ji siyasetê ye. Ew kincên kurdî, mûzîk û xwarinên Kurdî û tiştîn din ên Kurdî wek "berhemên balkêş ên çandî" bê konteksta siyasî, pêşkêş dikin. Ev yeka li halekê de ye ku nasnameya kultûriya Kurd bi salan e tê tepeserkirin û siyasî ye. Ew Blogerane wa li wan tiştan dikin ku bê metirsî û wek dîkorat bo geştiyaran bêne xuya.Herwisa hinek din ji Blogerên Kurd bi berdewamî tekeziyê li ser vê hindê dikin ku "Kurd beşeke resen ji şaristaniyeta Îranê ye û hewce ye ku bi yekîtiya netew, û serzemînê Îran" wefadar bimînê. Ev zimana bi zanebûn û bi armanca helandin û nehiştina "Mafê diyarîkirina çarewnivîsa gelê Kurd" tê bikaranîn.

**Teknîkên hûr ên vê projeyê**

Guherîna aliyê Heştega: wek mînak li dema nerizayetiyan de di cihê heştega wek #Jin_Jiyan_Azadî" yê heştega wek #Kurdistana_Ciwan an Kurdistana _Mêwanperwer" tirend dikirin.

Gefxwarin an rakêşana Blogeran: hekî Blogerek li derheq tepeserkirinê de biaxive, an gef li wî tê xwarin an malpera wî tê daxistin. Li hember de jî hekî hevkariyê bike, piştevaniyê li wî dikin û rêklaman verdigre.

Hevkariya organîk digel ragihandinên hilkûmî: piraniya blogerên ku li rû de serbixwe ne, naveroka wan ji aliyê ragihandinên hikûmî yên wek "Fars, Tesnîm an IRNA"yê ve têne belavkirin, bo vê yekê ku rewatiya zêdetir bi dest ve bînin.

**Rola bingehîn a tora "Bolgersaziya hikûmî" li Kurdistanê**

Li Rojhilatê Kurdistanê de li pîşta perdeya Blogerên ku li rûde serbixwe ne, toreke rêkxistinkirî û çendîn alî heye ku girêdayî bi navendên ewlehî, teblîxî û çandiyên rêjîma dagîrker a Îranê ve hene, wek:

Saziya îtilaat spaha pasdarn (SAS) ku navenda bingehîn a nasîn, rakêşan û alîdan bi Blogeran e. ew Blogerên Kurd ku potansiyela wan heye, an gefê li wan dikin an bo aliyê xwe radikêşin; Gefên wek "girtin, daxistina malper û qedexekirina derketin ji welat", rakêîşana wan wek "derfetnameya fermî bo kar, bûdce û rêklam û ewlehiya kar". Hinek caran jî "rênimîniya naverokê" bi Blogeran tê dan( wek mînak dibe ku postek li ser asayîş an yekîtiya niştmanîê danên)

Yeke din ji navendên alîdan bi Blogeran li Kurdistanê, "îdareya ferheng û îrşada îslamî ya Kurdistanê" ye. Wê îdarê, rola fermî û eşkere li piştevanîkirin li "karê çandî û midyayên xwecihî" heye. Wê îdareya komek ji rêkxirav ên bi navê xelkê û sexte çê kirine da ku Blogeran bikêşne jêr perên xwe. Herwisa yekek din ji karê vê îdareyê, dana deyn û derfet bi çalakvanên midyayî û rêkxistinên festîvalên cur bi cur e ku ew jî dibe sedema nêzîkbûna Blogeran bi rêjîmê. Navendeke din a desthilata rêjîmê li Kurdistanê ku li ser bilogeran dixebite, "deng û reng"ê rêjîmê li Kurdistanê de ye. Ew bi gazîkirina Blogerên Kurd bi bernameyên têlêvîzyonî, dixwazin wan bidin ber çavê xelkê û rasterast an nerasterast, pêgehek bo danîneberçav a "jiyaneke asayî û bextewer" li Kurdistanê çê bikin.

**Encam**

Li dawiyê de hewce ye ku bibêjim, li Kurdistanê de komek Blogerên din ên çalak jî hene ku armanca wan xizmetkirin bi Kurd û Kurdistanê ye û bi tevavî, serbixwe ne. pêka wan gotinan, naskirina Blogerên serbixwe ji Blogerên pêspartî, gelek zehmet nîne û hewce ye ku xelkê Kurdustanê bi piştevanîkirin li Blogerên serbixwe û guhnedan bi Blogerên pêspartî, pîlanên rêjîma dagîrker a Îranî li Kurdistanê de pûç bikin.

# Tenê rêya aramiyê pêkvejiyan e



N. Ûrarto Dilşîn



**Beşa 2**

**Pêşerojeke Hevbeş: Piştrastbûn bi Nirxên Mirovî û Çandî**

Gelên Kurd û Azerî li Urmiyê û deverên din ên Kurdistanê divê bînin bîra xwe ku tenê bi yekîtiyê dikarin rê li ber wan xeteriyan bigirin ku rejîm û hêzên tundrew ji bo wan çêkirine. Ji bo gihiştina bi pêşerojeke ronî û domdar, pêwîstî bi piştrastbûn bi nirxên mirovî, çandî û civakî heye. Yekîtiya di navbera Kurd û Azeriyan de ne tenê divê bê parastin, lê divê bê xurtkirin jî, da ku ti kesek bi bikaranîna siyaseta parçekirinê nekare vê girêdanê bişkîne.

Di vê rêyê de, ronakbîr, elît, partiyên kurdî û azerî û herwiha kesên navdar ji herdu neteweyan divê rola xwe bilîzin. Hişyarkirin û ronîkirina derbarê xeteriyên parçekirinê û girîngiya pêkvejiyana aştiyane divê di serê bernameyan de be. Gelê Kurd û Azeriyan divê bizanibin ku tenê li rex hevdu dikarin li hember gefên derveyî û navxweyî bisekinin û ji van qeyranan derbas bibin.

**Encamên Parçekirin û Nearamiyê di navbera Kurd û Azeriyan de: Xeterî û Astengî**

Aloziyên di navbera Kurd û Azeriyan de li Urmiyê û deverên din ên Kurdistanê, dikarin bibin yek ji xeteriyên herî mezin ji bo yekîtiya civakî û ewlekariya neteweyî. Dema ku parçekirin û nakokiyên neteweyî bigihêjin astekê ku bibe sedema aloziyên diyar di navbera van herdu neteweyan de, encam û bandorên wê dikarin ji bo civakê û welat bi awayekî gelemperî gelekî metirsîdar bin.

**1- Xeterî li ser Ewlekariya Civakî û Aştiya Giştî**

Yek ji encamên sereke yên parçekirinê, windakirina ewlekariya civakî û têkçûna aramiya giştî ye. Nakokiyên di navbera neteweyan de ne tenê bandorê li têkiliyên gel dikin, lê belê aloziyan çêdikin ku di dawiyê de ewlekariya civakî dixe bin metirsiyê de. Ev alozî dikare bibe sedema tundûtûjî û pevçûnên kolanan di navbera kes û koman de, û dê bibe sedema bêbaweriyê di nav gel de.

**2- Lawazkirina Aborî û Hevkariyên Civakî**

Li herêmên ku gel bi hev re hevkariyê dikin, wek Urmiyê, yek ji bandorên parçekirin û nakokiyên neteweyî, zirargihandin bi aboriya herêmê ye. Dema ku gel di nav nakokiyên navxweyî de bin, baldariya xwe û hêza xwe ji projeyên hevbeş ên aborî û civakî dûr dixin. Hevkariyên aborî ku berê li ser bingeha bawerî û rêzgirtinê bûn, niha bi pirsgirêkan re rû bi rû dimînin û di encamê de, asta rihetî û pêşkeftina civakî kêm dibe.

**3- Lawazkirina Nasnameya Neteweyî û Çandî**

Parçekirin di navbera du netewên mezin ên herêmekê de tê wateya windakirina nasnameya neteweyî û çandî. Dema ku gelê welatekî di bin zext û givaşên navxweyî û derveyî de bikeve nav parçekirinê, nasnameya hevbeş a welat, ku bingeha wê li ser rêzgirtina ji cihêrengiya neteweyî, çandî û zimanî ye,rastî gefan tê. Ev di demekê de ye ku Kurd û Azeriyan hertim bi hev re jiyane, û beşek ji dîrok û çanda Îran û Kurdistanê bûne.

**4- Afirandina Derfetê ji bo Neyaran**

Di rewşekê de ku nakokî û nearamî di navbera Kurd û Azeriyan de zêde bibe, dijminên derve dikarin ji vê derfetê sûdê wergirin û bi hêceta piştgiriya ji aliyekî şer, destwerdanê bikin, ku encama wê ji xeynî têkçûna aramî û ewlehî û komkujiyan ji herdu aliyan ti deskevteke din tunabe.

**5- Zirargihandin bi Ciwanan û Pêşeroja Civakê**

Ciwan hertim di bin bandora guhertinên civakî û çandî de ne û ji her cure parçekirin û aloziyan bibandor dibin. Ger ciwanên Kurd û Azerî di vê rewşê de mezin bibin, dibe ku nêrînên nerînî li hember hev çêbibin û rêya jiyana wan di bin bandora pêşdadwerî û tundrewiya nijadî de bimîne. Ev yek rasterast bandorê li pêşeroja civakê û pêvajoya pêşkeftina wê dike.

**Encam:**
**Yekîtî, Hêvî ji bo Pêşerojê û Bersivdana Astengiyên Pêşerojê**

Di rewşekê de ku nakokiyên neteweyî û aloziyên civakî li Îranê roj bi roj aloztir dibin, yekîtî û hevgirtina Kurd û Azeriyan wek çekeke bihêz li hember gefên navxweyî û derveyî xuya dibe.

Ev yekîtî ne tenê dikare rê li ber qeyranên civakî û aborî bigire, lê wek sembolek ji hêza gelên Îranê li dijî siyaseta parçekirinê û dîktatoriya rejîmê jî dikare kar bike.

Rejîma desthilatdar a Îranê di dirêjahiya van salan de hewl daye ku bi çêkirina nakokiyên neteweyî û olî, gel ji hevdu dûr bixe û bi vî awayî li ser çarenûsa welat zal be. Lê belê gelên Kurd û Azer nîşan dane ku ne tenê li hember van siyasatan teslîm nabin, lê bi hêzeke mezintir li rex hevdu, wek parêzvanên sereke yên aştî, pêkvejiyan û aramiyê disekinin.

Yekîtiya van herdu neteweyan bi fermî xewnên rejîma melayan ku ji bo çêkirina nakokiyan û cudahiyê di navbera Kurd û Azeriyan de dîtibûn, têk dibe. Dema ku gelê Kurd û Azerî bi vê têgihiştinê bigihêjin ku tenê bi hevgirtinê dikarin ji astengiyên pêşerojê derbas bibin û li hember qeyranan bisekinin, ti hêzek nikare di navbera wan de cudahiyan pêk bîne.

Ev yekîtî herwiha bersiveke bihêz dide rejîmê, ku ji her derfetê ji bo parçekirinê sûd wergirtiye. Gava ku gelên Kurd û Azerî li rex hev bisekinin û ji bo parastina mafên mirovî û civakî yên xwe têbikoşin, ev yek rejîmê ditirsîne. Rejîma dîktator ku li pey serdestiya li ser neteweyan bi rêya parçekirinê û leyîstin bi hestên neteweyî ye, baş dizane ku hevgirtina di navbera Kurd û Azeriyan de dê bibe astengeke xurt li hember siyaseta wê.

Di vê rêyê de gelên Kurd û Azerî divê hay li vê yekê hebin ku yekîtî û hevgirtina wan dikare wek xaleke bihêz, ne tenê gefên navxweyî paş bixe, lê belê dikare alîkariya baştirkirina rewşa aborî, civakî û siyasî ya welat bike, û wek modelek ji pêkvejiyana aştiyane ji bo neteweyên din ên Îranê û tev herêmê jî kar bike.

Hevgirtina rastîn û berdewamiya vê yekîtiyê tê wateya serkeftinê ne tenê ji bo Kurd û Azeriyan, lê belê ji bo hemû neteweyên bindest ên Îranê. Pêşerojek ku tê de ti rejîmek bi parçekirinê di nav neteweyan de serkeftî nebe, pêşerojek ku tê de gel, bi taybetî Kurd û Azerî li rex hev û bi rêz û evîneke tam ve dijîn.

## Nerîna



**"Mesûd Barzanî":**

**"Hewlên Sirri Sureyya Onder ji bo proseya aştiyê cihê pêzanîneke mezin e"**



**"Mezlûm Ebdî":**

**"Ked û xebata Onder ji bo aşîtî, careserî û jiyana hevpar di dil û bîra gelan de cihê xwe girt"**



**"Benjamin Netanyahu ":**

**"Donald Trump bi tevahî rast dibêje, êrîşên Hûsiyan ji Îranê serkaniyê werdigirin"**



**"Donald Trump " :**

**"Armanca danûstandinên li ser bernameya navikî ya Îranê ew e ku bi temamî bernameya navikî ya Îranê ji holê were rakirin"**

# Qeyrana "nasnameya niştimanî" li qonaxa nûgihanî û ciwaniyê de li nav gelên dagîrbûyî de



N. Rojan Sofîzade



Qeyrana "nasnameya niştimanî" yek ji pirsên kûr û aloz ên civaka dagîrbûyî wek civaka Rojhilatê Kurdistanê, bi taybet li nav ciwanan de ku mijûlê avakirina kesayetiya xwe ya kesîn û civakiya xwe ne. Koloniyalîzm wek peydabûyek çendîn alî, ne tenê her bandor bi ser pêkhateyên aborî û siyasiyên civaka dagîrbûyî de heye, belku bûye sedema qutbûna kûr a kultûrî û hundiriya wan jî. Li nav nûgihan û ciwanan de bi sedema warê hestiyarbûna şegekirina wan, bi berhevdanîn digel girûpên din, zêdetir rastî kiriza nasnamê tên.
Li vê mijarê de bi kurtî, dixwazim şirovê li ser aliyên curbicurên qeyrana nasnamexwaziya niştimanî li nav gelên dagîrbûyî û herwisa piştrastbûn bi teoriyên "Post Koloniyalîzm" bi taybet ji nêrîna "Frantz Fanon", paşhatên hundirî û cîvakî bikim.

**Nasnameya Niştimanî**

Li pênasa herî sade de, nasnameya niştimanî, seha girêdayî ya tak bi neteweyekê û seha hevpar li binyatên kultûrî, dîrokî, zimanî û civakiya vê netewê ye. Ev pênasekirin, beşek ji pêkhateya mezintir a nasnameya civakî ye û dikare roleke diyarîker li reftara takekesî û bi kom de hebe. Li rewşa asayî de nasname bi rêya malbat, damezraveyên perwerdehî ragihandinan û ceribandinên dîrokî yên civakê de bihêztir bibe, Lê, li civaka dagîrbûyî wek civaka Rojhilatê Kurdistanê ku li jêr bandora dagîkariya dewleta dagîrker a Îranê de ye, ev prose bi tundî tê paşxistin.

**Dagîrker û lawazkirina nasnameya niştimanî**

Li dirêjahiya dîrokê de hêzên kolonityalîstî bo bidestxistina kontrola bi ser hemû axên dagîrbûyî de ne tenê her dest bi ser jêrxanên aborî û samanên sirûştî ya wan de girtine, belku bi rêya dariştina pîlanên hûr, nasnameya kultûrî û dîrokiya gelên dagîrbûyî jî laweaz kirine. Wek mînak li Rojhilatê Kurdistanê, dagîrkerê Îranî bi rêya sepandina zimanê Farsî, dubarenivîsandina dîrokê(çewtekarî û destêverdan li dîroka Kurd û Kurdistan û Îranê), sivikatîkirin bi kultûra Kurdî û cihgîrkirina hêma û nirxên xwe, çarçove bo lawazkirina nasnameya Kurdistanî û alozkirina hizra civakî, amade kir. Ew siyasetane ne tenê her valatiya li navbera netewan zêdetir kir, belkû bû sedema vê ku nivşa ciwan heta astek zêde, seh bi girêdana xwe bi nasname û kok û reha kultûrî ya xwe ve bikin.

**Qeyrana nasnamê li nav nûgihan û ciwanên civaka dagîrbûyî**

Nûgihanî û ciwanî, qonaxeke hestiyar a geşekirina nasname ye ku mirov di vê qonaxê de cehdê dike cihê xwe li civak û cîhanê de diyarî bike. Li nava gelên dagîrbûyî de ciwan rastî duhevsengiya kultûriya tund tên: "Ji aliyekê bi rêya perwerde, ragihandin û damezraveyên fermî ve dikevne ber kultûra klonouyalîzmê, ji aliyê din ve li nav malbat an civaka xwe, kultûra resen a xwe verdigrin. Ev dijhevî, dibe sedema çêbûna curek ji "qeyrana nasnameya niştimanî" ku bi şêwaza "jixwebiyanîbûn" an înkarkirina derbasbûya xwe, an li hewldanên bo sekinîn li hember kultûrê, xwe bide nîşandan ku mixabin, vê yêkê pêsîra civaka Rojhilatê Kurdistanê jî giriye.

**Lêkevtên hundirî û civakiyên qeyrana nasname**

Sehkirin bi bênirxî û tevlîheviya hizrî, Ciwan seh bi nebûna girêdayî, xwedûrgirtin û bênasnametiyê dike.
Daxwaziya hevrengkirin digel kultûra koloniyalîzmê, Bi hêviya serkevtin an erêkirina civakî, hinek ciwan hewlê didin ku xwe digel kultûra koloniyalîzmê de bikin yek.
Tundajotiya kultûrî yan siyasî, li hinek rewşan de bo bersivdan bi qeyrana nasname, xwe bi şêwaza berxwedana tund a kultûrî, binyatxwazî an nasyonalîzma tundajo de didin xuya.

**Çend mînakên dîrokjî li wî warî de**

Frants Fanon" li pirtûka "The Wretched of the Earth"(Bextreşên Erdê) de bi serastî bas ji aloziya hundirî ya ciwanên Elcezayêrî li dema ku rastî kultûra Firansewî tên, dike. Ew li xwendingehan de bi zimanê Firansewî dihatine perwerdekirin û li mal de jî bi zimanê erebî an Emazîxî, dijiyan. Ew rewşa perçebûyî, li nav wan de bû sedema qeyrana hundirî û nasnameyiya berfireh.
Dagîrkirina Hindistanê ji aliyê Birîtaniyayê ve, Sîstema perwrde ya koloniyalîzma Birîtaniyayê, zimanê hindî lawaz kir û ziman û kultûra ingilîsî pêş xist. Piraniya ciwanên hindistanî li navbera wefadarî bi resmên kultûriya xwe û daxwaza serkevtin li çarçoveya koloniyalîzmê de tûşî gêjiyê bibûn.
Afrîqaya Başûr li serdema Apartaydê de; ciwanê reşpêst bilî givaşên siyasî û cudatîdanîna regezî, ji aliyê sîstema perwede û ragihandinan de jî givaş bi ser wan de hatibû xistin bo vê yekê ku kultûra Rojavayî, erê bikin û kultûra xwe înkar bikin. Ev prosa bû sedema berfirehbûna tevgerên berxwedana kultûrî û xwendekariyê.

**Encam**

Qeyrana nasnameya niştimanî li nav gelên dagîrbûyî de bi taybet gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, diyardeyeke kûr û çendalî ye ku kok û reha vê ji siyasetên kultûrî yên sitemkariya koloniyalîszmê de ye. Têgihîştina kûr ji vê qeyranê, bi taybet li nav nivşa ciwan de dikare bibe sedema çareseriyên bo geşekirina nasnameya resen û bihêzkirina perwerdeya kultûrî û afirandina rewşek bo danûstandinên li navbera nivşan de. Dubaremêzekirin li ceribandinên dîrokî û mifahvergirtin ji teroriyên rexnegirane, bo çareserkirna qeyrana nasnameyî dibe pêngawhilgirtinek girîng.

# Kurdên Dumilî (Yarsanî-Elewî) kengî û çawa ji Êzdatiyê qut bûne



N. Kemal Tolan

**Beşa 2**

Di lîsteya eşîrên Kurdan yên ku di nava koma Elewiyên Sefewî de cih girtine wehane. Şamlû, Şêxawend, Şadilû, Hacawend, Zaferanlû, Staclû, Kovanlû hene. Ji ber ku rengê Sor û kefiya Sor di nava Dumilî û Yarsaniyan de pîroze, ji wan re Kizilbaş gotine. Rengê Sor di nav Mezdekiyan û Xoremiyan de jî semboleke ku ew rasterast pêşiyên Yarsanî û Elewiyên Kurd'in." Beşa dawî di demek pêşde têye parvekirin.

Nivîskarê rêzdar kekê Wasfî Xana Êzdî Hekarî di vê pirtûka xwe* de dide xwanê û dibêje, "Gelek lêkolîn û nirxandinên civaknasiyê yên gerok û rojhilatnasên biyanî jî li ser gelê xwecihî yê Zagros û Torosan hene ku ew jî bi roniya hin lêkolîn û nirxandina hin berheman gihîştine hin encaman. 26 Anthony Kaldellis jî di vî derbarî de weha dibêje. Di sala 830'ê ya Zayînî de Komeke mezin ji Şervanên Xoramî (Horamî-Horeman) xwe spartin Împaratoriya Romayê. Encamên boyerê him di çavkaniyên romanî û him jî di çavkaniyên erebî de baş hatine belgekirin. Xoramiyên Çiyayî piranî Kurdên Azerbêcanê yên peyrewên baweriya Mezdekî bûn ku di dîrokekî pir pêş de ji Xoremana kevnar a "Kirmanşan û Xoremana Text ya Parêzgeha Kurdistana Rojhilat" Rojavayê Îranê hatine derbederkirin. Wan bi salan şerê Xîlafeta Ebasiyan kirin. Lê şkestin û berbi tunebûnê ve çûn. Vebijarka wan a herî baş ew bû ku xwe tevlî Artêşa Romayê bikin. Tê zanîn ku hêza Xoramiyan ji şervanan û penaberan pêkdihat. Tê zanîn ku koma yekemîn 14 hezar kes bûn. Bi hevalên xwe yên ku pişt re tevlîbûn, piştî demeke kurt hejmara wan gihîşte 30 hezarî. Împarator Theaphîlos (899-842) Xoramiyan di nav Artêşa Romayê de hildibijêre û di operasyonên leşkerî yên li dijî dijminên împaratoriyê yên li rojhilatê de balê dikşîne ser wan. Wan çend salan xizmeteke gelek baş ji wan re kirin, lê di dawiya padîşahiyê de Theopholîs ji wan guman kir. Wî serokê wan, ku bi navê Yewnanî Theophobas girt û biryar da ku wan li yekîneyên biçûk ên 2000 mêrî dabeş bike û wan belav bike, di nav mijarên ku ji hêla efserên Romayî ve têne fermankirin. Suryanî Mîkaîl dibêje dema ku hin Xoramî hatine Împaratoriyê, bi girseyî bûne mesîhî. Di vê xalê de wan dizanîbû ku saxbûna wana fîzîkî ji baweriya wan girîngtir e, ji ber ku piştî ku li rojhilat ji aliyê Ebasiyan ve hatin qetilkirin, li ber tunebûnê bûn. Zanyarên berê Thophobos bi General Narsê Xoremî naskiribûn lê Juan Sîgnes Codoner jî dibêje: Theobhobos Kurê General Narseh bû. 27

Rastiya wê çibe bila ew be, lê Îzady di pirtûka xwe ya lêkolînên li ser Kurdan de weha dibêje: Di wê serdemê dîroka Kurdistanê de jî lûtkeya tevgerên dînî yên ku bi navê Mezdek di dawiya serdema Sasaniyan de destpêkirine. Du pêşengên nû yên bi navê Babek û Narseh di bin navê "Xoremîyê" de pêşengiya tevgerê dikirin. Babek P.Z. di sala 817'ê de bi daxuyaniya xwe ya ku ew qasidê Xwedayî ye li Azerbêcanê destpêkir. Li dijî Xelîfeyên Ebasiyan serhildanek sedsalî destpêkirin. Bi rastî jî Babek tenê sernavek bû ku ji mirovekî şoreşger re hatibû dayîn, navê wî yê rast Hesen bû. Pir gengaze ku Babek guhertoya biçûk a bav e, ku tê wateya "qasidê Xwedayî" Ji ber wê yekê Babek bi îhtîmaleke mezin tê wateya "qasidê Xwedayî" yê biçûk, çawa ku dibe "Hesen" jê re bigota. Digel ku her tim teqez bû ku girêdanên dînî yên Babek wekî peyrewê êzdanîtiyê bû, îro jî eslê wî yê etnîkî diyar e. Di wê demê de, Azerbêcan qasî sêsed salan rawestgeha koçên Kurdan yên dijwar bû. Erdnîgar û dîroknasê misilman Yaqûbî di sala 891'ê zayînî de dinivîse ku serjimara Azerbêcanê ji du gelan pêktê. Herdu jî ji eslê xwe Îranîne, yek ji wan Azerî ye û yê din jî Cewanî yên ku desthilatdarên Bajêrê Badê yê ku berê Babek lê jiyaye. (Buldan, 48) Dîroknas Hawafî di berhema xwe ya bi navê Mucmal-î fasîhî, dora 1441'ê de temam bûye weha dibêje: Babek ji nav Cewandaniyan derket û serî hilda... Babek piştî mirina axayê xwe îdîa kir ruhê axayê xwe di vejîne û li der û dorê dest bi kiryarên xwe kir. Ji bilî eşîra Cewandan, Cewan Cafên îroyîn êşîrên Kurdan ên bi navê Belikan, Gerger û Badh bicih bûne. Li Çiyayên Sabalan ên Azerbêcana Rojhilat, Baladxorî-baladhurî, Futuh, 213. 1-8) Eşîrên Kurdan îro jî bi navên Belikan, "Baz û Bazaynî" hebûna xwe didomînin û Bad wekî paytexta Babek xizmet kir. Fermandarên Babek ku eslê wan ê êtnîkî bi berfirehî di çavkaniyên îslamî yên serdema navîn de hatiye diyarkirin, wekî Kurd hatine pênasekirin. Wekî mînak waliyê Merandê yê Azerbêcanê û yek ji fermandarên sereke yên Babek ji aliyê Yaqûbî ve wekî "Îsmayê Kurd." dihat binavkirin.

Narseh, ji aliyê dîroknasê îslamî Mesûdî ve wekî "Nasirê Kurd" hatiye tomarkirin ku li Başûrê Kurdistanê navenda dînê Kurdî ya xwecihî yezdanîzmê ye, serî hilda. Wekî ku dîroknasê misilman Teberî diyarkiriye, artêşên xelîfeyê Ebasî di sala 833'yê zayînî de piştî ku şêst hezar şagirdên Narseh kuştin paşê karine Narseh têkbibin. Pişt re Narseh bi piraniya şagirdên xwe yên sax mayî re filitî û xwe spart axa Bîzansê, li wir yekîneya kurdan a artêşa Qeyser Theophîlus avakir. Artêşa Theophîlus di sala 838'ê Z. de ji bo alîkariya tevgera Babek ku ji hev belav dibû, di sala 838'ê de êrîşî axa xîlafeta Ebasiyên misilman kir (Rekaya 1974, Rosser 1974) Lê belê, destwerdana Theophîlus bêfêde bû, ji ber ku Babek di dawiyê de ji hêla Ebasiyan ve hat têkbirin. Bîzansan şoreşger Narsê û leşkerên wî li Pontosê li bakûrê Anatoliya navendî bicih kirin. Çavkaniyên Bîzansî diyar dikin ku ev herêm ji bo ku penaber karibin di nav gelê xwe de bi cih bibin hatiye hilbijartin (Bury 1912) Ji ber wê yekê, ji bo ku Bîzansî Narseh û koma wî ya ji başûrê Kurdistanê wekî gelê Pontosî bihesibînin, divê civaka kevnar a Kurd a li Pontos, heta nîveka sedsala 9'ê de tevî ku bûye xirîstiyanî jî nasnameya xwe ya kurdî bi têra xwe parastine. Lê belê piraniya delîlên berdest epîsodîk in ku destûr bidin encamên teqez li ser pirsa nasnameya etnîkî ya Pontosan di heyamek wisa dereng de. Di her rewşê de tê gotin ku Narseh bixwe jî bûye xirîstiyanî û navê Theophobus li xwe kiriye.



Tevgera Yezdanî ya Babek û hebûna Kurdan a girseyî li Azerbêcanê rasterast bi qonaxeke pir berê ya tevgerên gelê Kurd ve girêdayî bû. Nêzîkî destpêka sed sala 4'an a zayînî, di encama koçkirina bi sedsalan a Kurdên Başûr û şert û mercên xweş ên civakî-aborî de, li bakûrê û rojavayê Kurdistanê li Anatolyayê, ketine serdemeke pir zêde ya serjimarê. Ku herikîna hozên (eşîr) Kurdan ber bakûrê, bakûr rojava rêjeya serjimarê aniye asteke wisa grêtîk ku guhertina herî biçûk di hêzên leşkerî yên organîze yên Împeratoriyên Sasaniyan û Bîzansan de, ku serjimara wan li rojhilat û rojava mabûn, wê bibe sedema seferberiyeke mezina mirovî. 28 Shahab Valî dibêje: 29 Li gor Madelung her çiqas çavkaniyên dema pêşî yên îslamê cih nedin tevgera mezdekî, ev civat di nav herêmên Îranê de belav bûne, civata herî xort li el-Cîbalê ango li çiyayên Zagrosê cihê xwe girtiye. Yek ji wan tevgeran, Ya Xoremdîn bû, ku bi serokê xwe Babekê navdar dihat naskirin. Babekê ku ji Meda'inê bû, ji aliyê Cavidan b. Sehl, serokê Xoremiyan ve hatiye ferqkirin, yê ku piştî demeke kurt miriye. Babek îdia kiriye ku ruhê Cavidan ketiye bedena wî û bi vî awayî alîgirên xwe zêde kiriye. Wî hêzeke nû û rêbazên şer ên taybet da wê tevgera dînî û civakî, ya ku beşeke ji mezdekîzmê ye. Wisa tê zanîn ku helwestên wî ji sala 816-17' emîn a Z. ve dest pê kiriye. Li gorî çavkaniyan tevgera Babek heta Cîbalê belav bûye. Babekê Mejûsî şerê çekdarî 23 salan berdewam kiriye. Dawiya dawî hatiye girtin û ew şandine Semîrrayê 4'ê rêbendana 838'an gihîştiye wir. Xelîfe el

Mu'tesem bi awayekî tund ew darvekiriye. Laşê wî li sêdarekê aliqî maye û navê wî danîne ser taxeke bajêr.Ev zevtkirin û darvekirina Babek dawiya tevgera Xoremiyan neanî. Tevger bi temamî winda nebû û bi navên din li Îranê xuya bû, bi taybetî li Zagrosê xuya bû ku îro civaka Yarsanan bi hejmareke mezin lê dijîn. Di nava hin çavkaniyan, de navê Babek wekî Babekê Mejûsî jî derbaz dibe. Mejûsî Kurdên rojparêz bûn. Peyrewên baweriya Ezdayî ya baweriya Xora Mezdekî bûn. Baweriya Mezdekî baweriya Xorra bû, ji Xoramêjda hatiye. Mejûsî, pir biaqil û zana bûn, li ser ezemet û ecêbiyên rojê û pergala asmanî pir mijûl bûne û peyrewên du'a-du'rozê bûne. Dema ku mirov li ser kevneşopiyên Kurdan lêkolînê dike, mirov dibîne ku sê parên dîroka Kurdan di mîtolojiya Kurdan de veşartiye. Parek ji wê jî Mejûsî ne Termîna Mejûsî-mêjûsî, yên ku bi hêza mejî tevdigerîn, li ser mêjûyê, pergala rojê û bi qewlên rojê ve têkildar bûn. Tê zanîn ku "Xoramêjde-Mêjdeha-Rojê" "Mêjûde ya Rojê" jî navê pirtûka wan a pîroz bû. Heke dîroka Kurdan di belgeyan de bi diristî nehatibe parastin jî, di mîtolojiya Kurdan de hatiye parastin. Wekî tê zanîn, mîtolojî yek ji hêmana herî girîng a çanda devkî ye. Ji ber wê jî bi qasî ku wek gotineke ku kes, bi kesî, nifş, bi nifşî hatiye veguhestin û derbazî nifşan bûye. 30"

(**Ev nivîs tenê nêrînên şexsî yên nivîskar derdixe pêş û temsîla nêrînên giştî yên malpera me nake**).

# Qurbanîkirinan welatiyên medenî bo peçavtina şikestên Spaha Pasdaran



N. Hesen Mukerem

Sipaha Pasdaran a Komara Îslamiya Îranê û rêberên Komara Îslamî ya Îranê, di gelek qonaxan de, bi taybetî di demên ku danûstandinên navneteweyî bi welatên Ewrupî û Amerîkayê re di rê de dene, kiryarên ku bi giranî van danûstandin û rêkeftinên navneteweyî sabote û asteng dikin an bikarin şikestên rejîma Îranê bipeçêvin, encan didin.

Kiryarên bi wî rengî ne tenê ewlehî û berjewendiyên dîplomatîk a Îranê xistine metrisiyê de, belkû gelek ji wan rasterast zirar dane berjewendî û ewlehiya cîhanî, û Îran di qada cîhanî de bêtir îzole kirine.

Ev gotar behsa hin kiryarên sabotaj û destwerdanên Spaha Pasdaran a terorîst û rêjîma Komara Îslamî di demên cuda de dike, ku bi danûstandinên girîng ên navneteweyî re hevdem in.

**1. Hewldanên ji bo afirandina krîz û bêîstîqrariyê li herêmê**

Di demên ku Îran bi welatên ewrupî re ji bo gihîştina peymanên navokî an ewlehiyê danûstandinan encam didan, Spaha Pasdaran a rejîmê, bi taybetî bi rêya torên xwe yên terorîst û komên bedel ên li herêmê, hewl daye ku bêîstîqrariyê biafirîne û di vî warî de, bi awayekî sîstematîk çalakiyên têkder li welatên cîran û herêmê û heta naxwe a welat de bi kar aniye.

**2. Piştgiriya komên terorîst ên li herêmê dike.**

Spaha Pasdaran a Komara Îslamî, bi taybetî bi rêya Spaha Qudsê, piştgiriya aborî, leşkerî û perwerdeyî daye komên terorîst û paramîlîter li Rojhilata Navîn. Ev piştgirî alîkarîya ji bo komên wekî Hizbullah li Lubnanê, Hemas li Xezeyê, Hûsîyan li Yemenê, û serhildayên Şîe li Iraqê dihewîne. Van koman bi armanca lawazkirina hikûmetên Rojavayî û destwerdana karên welatên cîran bi berdewamî çalakiyên terorîstî û teqîneve pêk anîne.Ev kiryar bi gelemperî bi demên hesas ên danûstandinên navikî an ewlehiyê yên Îranê bi welatên Ewrupî û Dewletên Yekbûyî ên Amerîka re hevdem bûne, da ku bi awayekî Îran ji givaş û dorpêçên dîplomatîk rizgar bibe an jî bi wî awayî şikestên xwe bipeçêre. Bo mînak, piştî peymana navikî an lihevkirina Bercamê ya JCPOA ya 2015an, Îranê destwerdana xwe li Sûriye û Yemenê zêde kir, ku rasterast ewlehiya welatên Rojavayî û hevalbendên wan, nemaze Erebistana Siûdî, gef lê xwar.

**3. Destwerdan di danûstandinên nukleerî de**

Yek ji mezintirîn pirsgirêkên ku Spaha Pasdaran û birêveberên Komara Îslamî tê de rol lîstin, hewldana têkbirina peymanên navikî an jî afirandina krîzên nû di dema danûstandinan de bû û bûye. Di gelek qonaxan de, dema ku danûstandinên navikî didomin, Îran bi taybetî di bin givaşa cîhanî de ye ku bernameya xwe ya navikî sînordar bike.

**Ceribandin û berfirehkirina mûşekan a bê destûr**

Di dema danûstandinên navikî yên bi koma 5+1 (Almanya û pênc endamên hertimî yên Konseya Ewlehiyê ya NY) re, Îranê gelek caran ceribandinên mûşekî pêk aniye. Ev ceribandin gelek caran çêbûne, nemaze dema ku danûstandin hesas bûn û nêzîkî rêkeftinekê bûn, ewqas ku gelek pispor li ser baweriyê bûn ku ev kiryar givaşên siyasî yên Komara Îslamî bûn da ku di danûstandinan de bêtir guherînkariyan bi dest bixe.

Her di vê pêywendiyê de, Spaha Pasdaran berpirsiyarê hin ji van ceribandinan û her wiha pêşxistina bernameya mûşekî ya Îranê bûye. Ev bername ji aliyê welatên rojavayî, bi taybetî ji aliyê Amerîkayê ve bi tundî hatine rexnekirin.

**Binpêkirina peymanên JCPOA**

Piştî îmzekirina peymana navikî ya JCPOA di 2015an de, gelek welatên rojavayî hêvî dikirin ku Îran dê pabendê sozên xwe yên sînordarkirina bernameya xwe ya navikî û qebûlkirina lêkolînên navneteweyî be. Lê belê di dema ku danûstandin berdewam dikirin, Spaha Pasdaran bi rêya kiryarên terorîstî li herêmê, ceribandinên mûşekan û pêşxistina binesaziya xwe ya navikî, ev sozên xwe binpê kirin, û nîşan da ku ew naxwazin bi tevahî werin çavdêrîkirin û givaş lê were kirin.

**Bikaranîna peymanan ji bo pêşxistina armancên siyasî yên navxweyî**

Di demên ku hikûmeta Îranê bi welatên rojavayî re danûstandin dikir da ku rêkeftinên aborî û siyasî bi dest bixin, hin berpirsên Komara Îslamî, bi taybetî endamên Spaha Pasdaran, hewl dan ku van danûstandinan bikar bînin da ku armancên xwe yên navxweyî pêşve bibin û bandora xwe ya siyasî û aborî li Îranê zêde bikin.



**Xurtkirina saziyên aborî yên girêdayî Spaha Pasdaran(IRGC)**

Yek ji pirsgirêkên sereke yên Komara Îslamî ya Îranê, girêdayîbûna saziyên aborî yên welêt bi Spaha Pasdaran ve ye. Di dema danûstandinên navikî û piştî JCPOA naskirî bi Lihevkirina Bercamê de, gelek kompanî û projeyên aborî yên Îranî, ku bi piranî di bin kontrola Spaha Pasdara(IRGC) de bûn, bi awayekî nefermî ji rakirina dorpêçan û çavkaniyên aborî yên ku piştî JCPOA hatin berdan feyde wergirtin. Vê ne tenê feyde da Spaha Pasdaran a terorîst, lê di heman demê de bi awayekî nerasterast serdestiya vê saziya terorîstî û cinayetkar li ser sektorên cûda yên aboriya Îranê zêde kir.

**Binpêkirinên mafên mirovan û zextên navxweyî**

Di demekê de ku Komara Îslamî ya Îranê bi welatên ewrupî re danûstandin dikir, di hundirê Îranê de, hikûmet û Spaha Pasdaran di heman demê de dijberên siyasî û çalakvanên mafên mirovan tepeser dike. Ev tepeserî bi berdewamî zêde bûn e, nemaze di demên ku danûstandinên navikî an ewlehiyê didomin.

**Tepeserkirina xwenîşandanên gel**

Di demekê de ku Îran di bin givaşên cîhanî de bû ji bo kêmkirina binpêkirinên mafên mirovan, Spaha Pasdaran(IRGC) bi taybetî di tepeserkirina xwepêşandanên gel û çalakiyên opozisyonê de roleke girîng lîst. Ji xwepêşandanên 2009an (Tevgera Kesk) bigire heta xwepêşandanên dawî yên di salên 2019 û 2022an de, Spaha Pasdaran(IRGC) bi awayekî berçav di tepeserkirina xwepêşander û çalakvanên siyasî de bi awayekî hovane aktîv bûye. Ev kiryar nîşan didin ku di demekê de ku hikûmeta Îranê di danûstandinan de ye û rastî şikestên dîplomatîk bûye, di hundirê welêt de, ne cihekî siyasî yê azad û ne jî mafên mirovan ji bo welatiyan hebûye û heye bi hemû awayî hewldaye şikestên xwe bi gorîkirina welatiyan bipeçêre.

Bûyerên wekî teqîna Bender Ebbas, xistina balafira Ukraynayê û êrîşên li ser gemiyên li Kendavê di nav mînakên herî zelal ên sabotaj û kiryarên neqanûnî û terorîstî de ne ku di demên ku Îran bi welatên Ewrupî an Amerîkayê re danûstandinan dike an jî di krîzên siyasî de ye, kiryarên hov encam dide. Ev cure kiryar siyaseteke giştî nîşan didin ku Komara Îslamî ya Îranê ji bo zêdekirina givaşan li ser aliyên biyanî û her wiha xurtkirina pozîsyona xwe di danûstandinên navneteweyî de û peçavtina şikestên di danûstandinan de bikar tîne. Di heman demê de, ev tedbîr ne tenê zirarê didin ewlehî û berjewendiyên neteweyî yên Îranê, lê di heman demê de givaşa Îranê li ser asta cîhanî zêde kirine û givaşên navneteweyî li ser Komara Îslamî jî dijwartir dikin.

Spaha Pasdaran a Komara Îslamî û rêberên Komara Îslamî ya Îranê, di dema danûstandinên hesas de bi welatên Rojavayî û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê re, kiryarên ku ne tenê bûne sedema hilweşandin û sabotajkirina peyman û danûstandinên navneteweyî, lê gelek ji van kiryaran rasterast bûne sedema lawazbûna pozîsyona Îranê di nava civaka navneteweyî de. Ev reftar, ji destwerdanên leşkerî û terorîstî li welatên herêmê bigire heya binpêkirina peymanên navikî û tepeserkirina navxweyî, hemî bi awayekî zelal hewlên Komara Îslamî ji bo parastina desthilatdariya xwe bi her awayî nîşan didin.

# Konferansê Qamişlo û giringiya parastina yekrêziya kurdî



N. Ebdûlazîz Qasim




Piştî helweşandina rejîma Be'is ya Sûriyê di 8ê Kanûna Pêşiyê 2024an de, û hatina Bereya Elnusra ya bi nav (HTŞ) ya di nav lîsteya rêxistinên terorîst de li ser desthilata Sûriyê û heta niha ku hîç guhertinek erênî ber bi mafên mirov û ber bi çareserkirina pirsgirêkên Sûriyê nehatine pêkanîn, û her wisa ku asoyek zelal bo çareserkirinê yan bo başkirina rewşa siyasî û aborî nehatine dîtin, lewra ku paşeroja Sûriyê jî ber bi çarenevîsek nediyar diçe, berovajî ku desthilata nû bi carekî daxwazên gelên Sûriyê piştguh dixe, bi taybetî daxwaz û mafên gelê Kurd ku têne paşguhxistin, hebûna gelê Kurd dubare piştguh dibe çi di avakirina artêş, hêzên ewlehiyê, hikûmet de û her wisa di destûrê de, zêdebarî gef û êrîşên rojane yên dezgehên wê ewlekariyê li dijî Kirstiyan, Ewlewî, Kurd û Dirziyan û tevlî berdewamiya gef û êrîşên Tirkiyê yên rojane li ser Rojavayê Kurdistanê û li ser gelê kurd.

Aliyên siyasî yên Kurdî, di vê qonaxa dîrokî û hestyar de û ji bo bersivdana xwest û daxwazên gelê Kurd, piştî çend salan ji nakokiyên siyasî û partayetî, karîn carek dîtir li hev kom bibin û bi yek helwest û yek nêrîna siyasî di konferansekî dîrokî de ku li Qamişlo di 27ê Nîsana 2025an de bi piştevaniya kurdên hemû parçeyên Kurdistanê û bi taybetî Herêma Kurdistanê û bi înîsiyatîf û navbeynkariyek navdewletî hat lidarxistin.

Konferansê Qamişlo tevlî ku bi destkeftek neteweyî mezin û bi gaveke dîrokî ya giring tê hijmartin, her wisa miletê kurd ji parçebûnê parast û dibe bingehek bihêz bo hebûn û parastina mafên gelê Kurd, namaze ku di konferans de pêdagirî li ser mafên neteweyî yên Gelê kurd hate kirin û her wiha pêdagirî li ser yekparçeya xaka kurdistana Sûriyê (Rojavayê Kurdistanê) bû wekî yek herêma cugrafî û neteweyî ji Efrînê heta Dêrikê, zêdabarî pêdagirî li ser federalîzmê û mijarên demokratî tevlî guvaş û gefên herêmî jî bi taybetî gefên Tirkiyê.

Yekrêzîî û helwesta Kurdan di vê qonaxa dîroka de bû rastiyek û divê hemû aliyên siyasî pabend bin bi encamên Konferans bo bidestxistina mafên gelê Kurd û pêkanîna armancên xwe yên neteweyî di pêvajoyên siyasî de.

Guvaş û fişarên Tirkiyê û her wiha yên hikumeta nû jî li ser Gelê Kurd dê berdewam bin, nemaze ku ev hikumet di qada navdewletî de hêjî nehatiye qebûl kirin û hêjî HTŞ di nav lîsteya terorê de û bi terorê û komkujiyan û kuştinê bersiva daxwazên gelên Sûriyê dide, wekî komkujiyên meha Adarê li dijî Elewiyan û niha li dijî Dirziyan, û dûr nîne ku li dijî gelê Kurd jî komkujî wisa bêne pêkanîn, nemaze piştî nerazîbûna wê li ser Konferansê Qamişlo, ku bi zelalî xuya dibe ku vê hikumetê hîç niyazek bo çareserkirina doza kurdî nîne.

Lewra ku pêdiviyek mezin bi yekrêzî û tifaqa kurdî heye û divê ev rêkeftina Qamişlo bihête parastin û hewldanên siyasî û diblomasî bihêz bibin ji bo bidestxistina mafên gelê Kurd û hemû armancên neteweyî di Sûriyê de.

Tevlî encamên erênî û giring yên yekrêziya Kurdî li Rojavayê Kurdistanê, helbet ku ev yek dê kartêkirinek erênî li hemû partî û aliyên siyasî yên Kurdî û Kurdistanî jî li tevaya Kurdistanê bike.

Em îro dikarin bêjin ku li Rojavayê Kurdistinê qonaxeke nû destpê kiriye û dê li hêviya encamên baş û berhemdar bin.



# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Rêjîma Îranê li 10ê Banemerê de zêdetir ji 12 kesan bidar vekirin



Ji destpêka heyva banemerê ve rêjîmê zêdetir ji 48 girtî li girtîgehên xwe li seranserê Îranê de bidar vekirin û li 10ê Banemerê de jî zêdetir ji 12 girtiyan li girtîgeha Qizilhisarê li bajarê Kerecê, girtîgeha Sipêdar li bajarê Ehwazê û Wekîlabad li bajarê Meşhedê, bidar vekirin.

Pêka raporên belavbûyî roja Çarşwemî 10ê Banemera 1404 a Rojî, "Muhsîn Lengernişîn, Esxer Wetenperest, Hemîd Fazilî û girtiyekî din ku nasnameya wî nehatiye zanîn" li girtîgeha Qizilhisar a rêjîmê li bajarê Kerecê, "Mihemednebî Zîrkar û girtiyekî din ku nasnameya wî nehatiye zanîn" li girtîgeha Sipîdar a rêjîmê li bajarê Ehwazê de hatine bidarvekirin.

Herwisa li vê rojê de "Ebdulxefar Berahûyî (Liceyî), Perwîz Destkale naskirî bi Nûredîn Liceyî, Ebdulsemed Gurgîc (Rîgî), Mehdî Ezîzî, Cawîd Gulebeçe û girtiyekî din ku nasnameya wî nehatiye zanîn li girtîgeha Wekîlabad a rêjîmê li bajarê Meşhedê de hatine bidarvekirin.

Rêjîma Îranê sepandina sizaya bidarvekirinê û herwisa birêvebirina vê sizaya sepandî, wek alavek bo tepeseriya zêdetir a xelkê Îranê bi kar tîne.

## Rêjîma Îranê 2 kolber li sînorê Hengejalê birîndar kirin



Hêzên hov ên rêjîmê li sînorê bajarê Banê bi awayê rasterast û bê agaehdarkirtina berê, teqe li 2 kolberan kirine ku li encamê de ew kolber birîndar bûne.

Pêka rapora Kurdpayê, roja Yekşemî 7ê Banemerê, 2 kolber ên bi navên "Ako Şerîfî" temen 22 salî û Şiwane Elîpûr 25 salî" yên xelkê bajarê Banê, li encama teqeya rasterast a hêzên rêjîmê li sînorê "Hengejal"ê ser bi bajarê Banê, birînbdar bûne.

Pêka vê raporê, hêzên hov ên rîjîmê, bê agehdarkirina berê û bi awayê rasretarst teqe li wan 2 kolberan kirine

Ew 2 kolberane bo çareseriya pizîşkî bo navendên dermanî hatine veguhastin.

## Rêjîma Îranê hunermendekî xelkê bajarê Makoyê binçav kir



Hêzên îtilaata rêjîmê bi awayê xoserane û bê hebûna ti belgeyeke yasayî, êrîş kirine ser mala hunemnmendekî Kurd û ew binçav kirin û mala wî jî tevtêş kirin.

Pêka Rapora "Çaw News"ê hunermendekî xelkê bajarê Makoyê yê bi navê "Hesen Ehmedî" naskirî bi "Hesen Rênas", ji aliyê hêzên îtilaata rêjîmê ve hatiye girtin, pêka vê raporê, hêzên ewlehî tevî binçavkirina neyasayî ya wî hunermendê Kurd mala wî jî bi awayê xoserane vekolîne.

Hesen Rênas hunermendekî naskirî yê bajarê Makoyê ye ku li "Navenda Çandî û Hunerî" ya bajarê Makoyê de çalakiyên hunerî û çandî hene.

Hêzên îtilaat rêjîmê heyamek e ku li Rojhilatê Kurdistanê de bi awayê xoserane û neyasayî, mamostayan, ciwanan, hunermendan, xelkê medenî û mamostayên olî binçav dikin û li dema vekolîna malên wan û binçavkirina wan de ti belgeyeke yasayî nînin û rastî îşkencekirinên hovane û tohmetên çewt û bê binyat tên.

Heta belavbûna vê nûçeyê, ti zanyariyek li derheq sedema binçavkirina xoserane û tohmetên sepandî bi ser wî hunermendê Kurd û cihê ragirtina wî nehatiye zanîn.

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (493)